

Wek dawî divê em hersê pirsên jorîn li ser van mînakên bibersivînin. Zor pêwîst e em van pirsan bi awayekî eşkere bipirsin, bikevin pey kok, sedem û encama van yekan.

Hacî Qadirê Koyî û Hilatina Neteweperweriya Kurdî

FARANGIS GHADERI

Jî ÎNGILÎZÎ: FEXRIYA ADSAY

Kurte

Neteweperwerî ji bo sazkirina “civata muxayel” bi amrazên wêjeyê re di nav pêwendiyê de bûye. Li Ewrûpayê hilatina neteweperweriyê wek şêweyek wêjeyî bi hilatina romanê re ketiye tev, lê di wêjeya kurdî de ev helbesta modern e ku hevalbendiya vê fenomenê kiriye û roman, wek cureyekî berbiçav, heta 1950yî jî ne li holê bû. Di vê nivîsê de ez nîqaş dikim ku gelekî beriya peydabûna çapemeniya çapxaneyî, ku di xebatên li ser destpêka neteweperweriya kurdî xala navendî ye, bo kurdan bingeha neteweyê di nav hilberîna helbestkî ya dawîya sedsala 19. de û bi taybetî bi helbestên Hacî Qadirê Koyî (1817-1897) hatiye avêtin. Koyî wateyek nû ya kurdariyê afirand û wek “weten/welat” diyar kir, ev bi wateyek nû a siyasî axeke sînorkirî bû, wî bi vê hîmên neteweperweriya kurdî avêt. Ez ê li ser rabêja helbestkî ya Koyî, retorîka wî ya tehrîpkar û tevkariya bo avakirinê, geşbûn û belavbûna neteweperweriya kurdî bisekinim. Xebateke li ser deqên wêjeyî yê dawîya sedsala 19. ku heta vêga nehatiye dîtin, wê dînamîzma neteweperweriya kurdî û peywendî peydabûna wê ya tevlihev ronîtir bike.

¹ Ev nivîs ku bingeha xwe ji lêkolîna bo teza doktorayê digire li konferansa BRISMESê ya li Zanîngeha Sussexê (16-18 Pûşbera 2014an) hatiye pêşkêşkirin. Ji bo kurdîya wê nivîsê ez spasîyên xwe pêşkêşî wergêr Fexriya xan dikim.

Helbesta modern a kurdî di nav peywenda guherînên civakî û siyasî ya dawîya Împeratoriya Osmanî de peyda bû. Lewma, xebitîna helbesta modern, peywend û pêvajoya werarbûna wê derfeta lêkolinkirina wechên binuans ên dinamîzma civakî û siyasî ya Kurdistanê dawîya sedsala 19. û 20. dide û dikare wechên dirok û siyaseta kurdî ku kêr tê zanîn kişif bike. Di têkoşînên kurdan ên civakî û siyasî de û di geşbûn û belavbûna neteweperweriya kurdî de, helbestê roleke heyatî listiyê. Her çiqas wek amrazek bo neteweperweriyê li ser giringiya romanê hin lêkolîn hatibin kirin jî, heta vêga helbest bi awayekî di ser re hatiye qevaztin. Lê, ez di xebata xwe de angaşt dikim ku roman ne, helbesta modern rêhevaltiya peydabûna neteweperweriya kurdî kiriye. A rast, li pişt guherîna wêjeyî û pejirandina şeweyekî nû/modern ê helbestê neteweperweriya kurdî ajoyeke girîng bû. Digel ku bi şeweyê klasîk û bi wezna arûzê nivîsandiye, ez peydabûna helbesta kurdî a modern bi HacıQadirê Koyî ve didim destpêkirin². Di vê nivîsê de, ez di helbesta wî de bi tenê aliyekî moderniteyê niqaş dikim ku di dawîya sedsala 19. de himê neteweperweriya kurdî daniye. Di helbesta Hacı Qadir de neteweperweri temayeke girîng e û rê li ber guherîna rabêja wî ya helbestkî vedike. Heta vêga hatiye pêşniyazkirin ku behsa neteweperweriya kurdî ya dawîya sedsala 19. tenê li ser bûyerên dirokî û siyasî (mînak, serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî) bê kirin û ev gelek caran hatiye rexnekirin. Lê, palpišta min xwe dispêre xwendineke ji nêz ve ya deqên wêjeyî yê dawîya sedsala 19. û bi taybetî helbestên Hacı Qadir.

Piştê ez rave dikim ka çima helbestên Hacı Qadir neteweyî ne û kişif dikim ku rêbaza berhema wî jî berhemê selefên wî Salim û Kurdî cuda bû. Welatperwerî jî neteweperweriyê, ku fenomeneke modern e, cuda di helbesta kurdî a klasîk de bi taybetî di helbesta êwîra Baban de temayek sereke bû. Ji bo armanca vê nivîsê, ez çar taybetiyên helbesta Hacı Qadir diyar dikim ku rabêja wî ya neteweyî niqaş bikim û ez ê bi hûrgilî li ser wan bisekinim: romantîzêkirina kurdan û berzkirina pêşeroja wan, wateyên nû yê peyvên "milet" û "dewlet", watedarkirina nû ya "wetenê" û dupatkirina giringiya zimên.

Romantîzêkirina kurdan

Hacı Qadir ji gelek helbestvanên din ên dawîya sedsala 19. bêtir peyva "kurd" û yê bi wê ve girêdayî, "kurdî" "Kurdistan" "el ekrad" emilandiyê. Di dîwana wî de ku Mîran û Şareza edit kiriye, peyvên kurd û Kurdistanê ji 70 caran zêdetir hatine emilandin³. Her çiqas di helbesta klasîk de qala kurdan û wêrektî û esilbûna wan

2 Di teza xwe de ez li dijî nirxandina wêjeya kurdî ya kevneşopî derdikevim ku helbestê li ser taybetiyên şeweyî şirove dike û dijberiyek dualî ya helbesta klasîk û modern pêşniyaz dike.

3 Sedar Mîran û Kerim Şareza (eds.) (2007). *Dîwanî HacıQadiri Koyî*. Ed. Sedar Mîran û Kerim Şareza. Sinê: Pertook.

hatibe kirin jî, gelê kurd bi temamî pir kêr caran bûye mijara qesîde û zezelan. Hacı Qadir pesnê kurdan bi qehremanî, xweşmêrî, fedakarî û esilbûnê dide, herwiha bo serbilindî û xwe-hurmetiyê îlham dide xwînerên xwe.

Le gawan û şiwani kurdekan yek	bes e bo leşkiri sed kerre dû lek
Fiday cutyartan bê Hatemî Tey	be qurbanî sepantan Ali Bermek
Mirişki êwe seyyadi şehin e	le kin 'enqa firrûce Hecileklek (r. 68) ⁴

Di vê helbestê de ji bo ku xweşmêrî û xêrxwaziya kurdan dupat bike, hin berawirdkirinan dike; qehremaniya artêşêke bi sedhezâr leşkeran tenê bi şivan û gavanekî, ku karê wan ne şerkirin e, tê miqayesekirin. Hatem, di wêjeya nivîskî û gelêrî ya ereb, faris û kurdî de sembola xêrxwaziyê ye, wek tebeqeya herî nizm a civakê bi xêrxwaziya cotkarên kurd re tê beramberkirin. Ali Bermek malbateke îranî bû ku di dewra xelîfeyên ebaşî de xwedî nifûzeke mezin bû. Bi berawirdkirina esilzadeyên ereb û îraniyan a bi tebeqeya nizm a kurdan re lê ne bi esilzadeyê wan re, Hacı Qadir destnîşan dike ku kurd jî yê din berzîtir in. Di rîsta sêyem de angaştê xwe dubare dike, legleg û anqayê, balindeya mîtolojîk dide ber hev. Tê zanîn legleg hêlîna xwe li ciyên bilind çêdike, lê ew nikare bi anqaya li lûtkeya çiyayê Qafê ku di helbesta klasîk de wek ciyê herî dûr ê rûzeminê tê naskirin, bê miqayesekirin.

Bi hîlbijartina teswîra ji xwezayê û mîtolojiyê û berawirdkirina kurdan bi aferîdeyên dersiruştî re, Hacı Qadir teşebus dike ku bi kurdan re hesta raseriyê çêbike. Nerîna wî ya romantîk a derheqê kurdan de ji bo fikra raseriya êdîn tehrîb bike û dijberiyek siyasî bide destpêkirin, ajoyeke bêbîr (unconscious drive) vedijîne.

Hacı Qadir di xezeleke din de tenê berawirdkirinên jor dubare nake û wêrektî û fedakarîya kurdan pîroz nake, lê ji bo ku kurdan wek neteweyêke xwedî dirokeke kûr pêşkêş bike, hin stratejiyên din jî diemilîne.

Xo dezani sulaley Ekrad	lêrewê bigre ta degate Qubad
Hemû 'alim, hemû şêx û mir in	zîrek û jîr û ehli tedbîr in
Be dirêji le wan (?) ke raburdin	ta be Şîraz û Îsfehan Kurd in
Şehsewar in, piyadeyan aza n	berdî nişan û kullkî meydan
Dan û bexşinyan le la bawe	xûnî meydanyan le la aw e
Be şecaet hemû wekû Rostem	be sexawet hemû wekû Hatem
Le wefa Simweil û Îsmâ'il	'ehd û peymanyan çiyay Qendil
Gurdî Şaname pakyan Kurd e	kafi em safê kafi ew wirde
Le şerra zor def'e qewmawe	Romînyan çî lon cewab dawê (r. 180)

4 Hemû jegirtinên di vê nivîsê de ji dîwana Hacı Qadir a ku Mîran û Şareza amade kirine.

Bi binxêzkirina koka kurdan a esil û qedîm, îdia dike ku koka kurdan diçe heta Qobad ku qraleki îranî yê kevn bû û ewil qraliyeta Îranê damezrandiyê⁵. Dibêje şervanên Şehnameya Firdewsî ji kurd bûn, tenê li ser manendiya navbera peyvên "gord" û "kord". Wek parçeyek ji dîroka kurdan bi qalkirina qral, esilzade û xweşmêran, Hacı Qadir ji bo kurdan dîrokeke biihtîşam diafirine. Haya wi jê heye ku destnîşankirina dîrok, ziman û çandekê pêşmercên destnîşankirina netewetiyê û meşrûkirina serxwebûna siyasî ye.

Watedarkirina nû ya "dewlet" û "milet"

Guherînên civakî û siyasî her tim bi têgeh û peyvên nû re ku rûdana riwange, armanc û hedefên sistema nû ne, dimeşe. Sistema îdeolojîk a nû ligel têgehên xwe yên nû, hin wateyên nû yên îdeolojîk ji li peyvên ku di zimên de mewcûd in ji bar dike, herwiha wateyên wan diguherine û wan li ferhenga sistema nû zêde dike. "Milet," "dewlet," û "weten" ji ew peyv bûn ku, wek binyadeke siyasî ya nû bi hilatîna neteweperweriyê re, wek erebî, farisî û tirkî, di kurdî de ji wateyên nû bi dest dixin û dibin peyvên hevpar ên rabêja neteweperwer. Angaştî min ew e ku di zimanê kurdî de guherîna di wateya van peyvên cara yekem di rabêja helbestkî ya Hacı Qadirê Koyî de pêk tê û di beşa din de ez rave dikim bê ji emilandina wan a di helbesta klasîk de çawa cuda bûn.

Di helbesta kurdî a klasîk de "dewlet" tê wateya dewlemendî û hebûnê (Aref, 2009, r. 401). Wek minak Salim, helbestvanekî sedsala 19. peyva "dewlet"ê û dijbera wê "bêdewletî"yê di ristên jêr bi kar tîne,

Axirî her dû la, dewlet û bê dewletî peykî ecel tey deka herçî feraz û nişib⁶

Lê Hacı Qadir vê peyvê di wateya wê ya modern de, "dewlet" bikartîne. Di qasîdeyekê de heyfa wi li kurdan tê ku haya wan ji guherînên dewra wan nîne û di bîra wan tîne,

Be xeyrî Romî û Înglis û Rusî bê hedd in dewletan nawyan binûsî
Le cêy xoyan hesatwin be xîret le dinya nawî xoyan nawe dewlet (r. 195)

Di qesîdeyek din "Xakî Cezîr û Botan" de navên çend dewletên nû-ava wek Sûdan, Bulgaristan, Sîrbistan, Yewnanistan û Ermenistanê dide;

Her diwênê ehlî Sûdan hestane pê wekû şêr
êstêke musteqill in mehsûdî kullî edyan

5 Prods Oktor Skjærø, "KAYĀNĪĀN iii . Kauui Kauuāta, Kay Kawād, Kay Kobād (Kay Qobād)," *Encyclopædia Iranica*, online edition, 2014 li <http://www.iranicaonline.org/articles/kavianian-iii-berdest> & (nêrina malperê 17 Sibat 2014).

6 Arif, Muhemed Nûrî. (2009) . *Ferhengî Dîwanî Şaêran Nalî, Salim, Kurdî*. Hewlêr: Aras

Bulxar û Sîrb û Yonan, hem Ermen û Qeredax her pêncyan be têdad nabin be
qeddî Baban

Her êke musteqill in, kullêkî dewletêk in
sahêbî ceys û raye erkani 'herb û meydan (r. 82)

Di helbesta Hacı Qadir de peyva "milet" ji di wateya wê ya modern de tê emilandin û bi awayekî eşkere xwedî imayek siyasî ye, ji ber ku di nav "milet"ên din de wek "milet"ekî qala kurdan dike.

Her Kurde le beynî kullî millet bê behre le xwêndin û kitabet
...
Milletî bê ktêb û bê nûsîn xeyrî Kurdan niye le ruy zemîn (r. 219)

Weten

Weten di emilandina klasîk de tê wateya "ciyê jidayikbûnê" û di wateya "malbajar" an "bajarê jidayikbûnê" de tê emilandin⁷. Di helbesta kurdî de, helbestên Baban ên nivê sedsala 19., wek Nalî, Salim û Şêx Reza, hemûyan li sîrgûniyê derheqê weten de nivîsandine, lê li gor wan weten dihat wateya bajarê jidayikbûnê Şarezûr, Silêmanî û qesîdeyên wan i wetenperwer derheqê nostaljiya windakirina ew rojên xweş ên hukimdariya Baban de ne.

Nişaneya yekem a guherîna wateya "weten"ê an "welat" di helbesta Hacı Qadir de tê ditin. Koyî di qesîdeyek xwe de "weten"ê ji bo malbajarê xwe bi kar tîne, lê di helbestên xwe yên din de wateya peyvê ji sinorên malbajarê wî derbas dibe. Di qesîdeya xwe ya navdar "Xakî Cizîr û Botan" de ku li hemberî hilatîna neteweperweriya ermenan hişyar dike, wek axa Cizîr û Botan qala "welatê kurdan" dike.

Xakî Cizîr û Botan, ye'nî willatî Kurdan sed heyf û sef mexabin deyken be Er-
minstan (r. 78)

Di heman qesîdeyê de, ji bo hilweşîna mîrekiyên Rewandiz, Baban, Erdelan, Cizîr û Botanê dikeribe,

Kiwa walîyî Senendec, begzadeyî Rewanduz
kiwa hakimanî Baban, mirî Cizîr û Botan...

7 Lewis, Bernard. (1988). *The political language of Islam*. United States of America: University of Chicago.

Kiwa ew demey ke Kurdan azad û serbexo bûn sultanî mulk û millet, sahibî ceşş û 'irfan (r. 79-80)

Ji helbestvanên Baban cuda, ku tenê ji bo têkçûna mîrektiya Baban dikeribin, Hacı Qadir heyfa wî li têkçûna hemû mîrektiyên kurdan tê, Erdelan, Rewandîz, Botan û Baban. Welatê kurdan di nav şertên mîrektiyên têkçûyî de teswîr dike û wan wek dewra zêrin ku kurd tê de azad û serbixwe bûn ji nû ve texeyul dike. Ji aliyê Hacı Qadir ve berfirehkirina watedarkirina welêt a ber bi sinorên hemû mîrektiyên ve û keribandina wî ya bo ew dewra zêrin a xwe-îdarekirinê, her çiças wêneyekî xumami ji be, di texeyulkirina wareki hevpar ê erdnîgarî de li ser rabêja netewe-perweriya kurdî bandorên mezin kiriye.

Helwesta Hacı Qadir a romantîk nehiştiye şayesandina welêt wek wareki erdnîgarî yê sinorkirî bimîne,

Be drêjayî le wan (?) ke raburdin ta be Şiraz û Îsfehan Kurd in (r. 180)

Ligel vê, behsa fenomena serjimariyê dike, ku di terifa welat a modern de hoka-reke heyatî ye,

Çiwar milyon e Kurdistan nifûsî be qissey ehli texmînî ke nûsî (r. 193-194)

Ziman

Ziman aliyekî nasnameyê yê giring e û kontrolkirina wî bûye yek ji taybetiyên tepisandina emperyal ên herî giring⁸. Di peywendên kolonyal de "ziman dibe am-raza ku bi saya wî 'rastî', 'nizam' û 'realîte' tê bicihkirin."⁹ Digel ku pergala perwer-dehiyê ya kolonyal (a erebî, tirkî û farisî) li ser zimanê kurdî hatiye ferzkirin, di serdema klasik de ji hegemonyaya zimanê farisî wek zimanê wêjeyî û erebî ji wek zimanê zanistê ji bo zimanê kurdî û emilandina wî tehdîdên mezin bûn. Ji ber vê sedemê, helbestvanên klasik ên ku bi kurdî dinivîsandin gelek caran bijartina xwe ya nivîsandina bi kurdî diparastin. Hacı Qadir ji di gelek helbestên xwe de mijara zimên û girîngiya wê derxistîye pêş. Helwesta wî ya li hember vê meseleyê, digel ku hineki dişibe ya Xanî, ji ya selefên xwe gelekî cuda ye. Cudatiya herî mezin perdeya dengê wî ye, ku berovajî ew perdeya dengê lêborînxwaz a helbestvanên klasik, ser-hildêr e (confrontational). Li hember hegemonyaya zimanên farisî û erebî qaçibo dike û hin mitên derheqê zimanê kurdî de hildiweşîne.

8 Ashcroft, Bill, Griffiths Gareth, and Tiffin, Helen. (1989). *The Empire Writes Back: theory and practice in postcolonial literatures*. London/New York: Routledge.

9 B.n.b.

Di qesîdeya "Kurdêki Koyî" de hûrgiliyên rasthatina xwe ya bi kesekî ji Koyê, malbajarê wî, ku giliyê Şêx Kake Ehmed dike ku Quran û hadîsên pêxember wer-gerandiye bo kurdî, vedibêje. Piştî gazinên wî Hacı Qadir hêrs dibe û şîrove dike,

Her ke way gut mûkedder bûm
Gutim êştas le ser kerî mawî
Kurdî axir billê çi ye 'eybî
Lefzî Kurdî billaw nebû gird bû
Le fesahet bila mu'erra bê
Be zubanî keç û xetî xwarî
Çûne naw mo'ezzemati mîlel
Ya le gell Farsî çi ferqî heye
Ba wicûdî eger bikey diqqet
Çûnke ême qedîmtr in le ewan
Axir em 'eqlleyan hebû boyê
Bûne ustadi Farsî û Tazî
Çûnke sermaye mallî xellqî bû

wam dezanî ke wa le din derçûm
ça bû mistim neda le nêw çawî
her kelamî Heq e niye eybî
wa le mabeynî ême da tê çû
çi qiyamet be Ermenîş nabê
be ceride û kitêbi xelwari
weqt e xoyan hisab biken be duwel
bo çi ew rast e bo çi em keçe ye
tê degey kam le kami ye sirqet
be tewarixî cumleyî edyan
ger sulemanî ye we ya koyê
ta geystin be Fexrekey Razî
weqtê midrin hemû be hiç derçû
(r.201-202)

Hacı Qadir di qesîdeya xwe de, bi minakdayîna ermenan di navbera geşkirina zimên û daxwaza netewe-dewletê de pêwendiyek yekser datîne. Bi kurdan re dixeyide ku zimanê xwe ihmal dikin û wan bi ermenan re ku li zimanê xwe miqate ne, dide ber hev.

Helwesta wî ya biçûkkirina zimanê ermenî ji bo xurtkirina angaşta wî ye ku hemû ziman xwedî kapasîteya geşbûnê ne û dikarin berhemên huner û zanistî hil-berînin. Piştê kurdî bi farisî re berawird dike û ew nerîna ku kurdî peyvên xwe ji farisî girtiye û herwiha zimanekî payenîzm e hildiweşîne, îdîa dike ku kurdî ji farisî qedîmtir e, farisî zimanekî deyndar e, ne kurdî. Angaşta dike ku berhemên bi zimanê kurdî nehatine nivîsandin bêmane ne, ji ber ku ew ne aîdî ziman û çanda nivîskar e.

Keribandina Koyî a ji bo ihmalkirina zimanê kurdî ji ber vê ye ku wî hay jê heye windakirina zimanê xwemalî windakirina çanda miratê ye jî. Behsa şexsiyetên pê-şerojê dike û li ber dikeve ku navên wan wînda dibe û tê jibîrkirin ji ber ku dîrokeke kurdan a bi zimanê wan tune ye.

Kitêb û defter û te'rix û kaxez be Kurdî ger binûsraye zubanî
Mela û şêx û mir û padşaman heta mehşer dema naw û nişanî (r. 148)

Hacı Qadir, zanibû ku geşkirina zimên bêtî piştgiriya dewletê ne gengaz e. Wek ku Hassanpour ji bo Xanî dibêje, Hacı Qadir "di geşkirina zimên de di navbera du

wezîfey xom be cê hêna temami

emendey pe kîra deçare nusi
be şîr û dewllete millet nizami

(r. 212-213)

Encam

Xebatên li ser destpêka rabêja neteweperweriya kurdî bi pirani li ser kovar û rojnameyên kurdî yê ewil in û pir kêma in, ger hebe jî, li ser deqên wêjeyî yê dawî ya sedsala 19. û destpêka sedsala 20. hûr bûne. Lê, ji ber rêjeya kêma xwîneran, li gor kovar û rojnameyan bêtir berbelav û xwedî bandor bûne lewma xebata di warê deqên helbestkî de nişan dide ku ji bo xwendina neteweperweriya kurdî ev gelekî girîng e. Wek ku min hewl da ku bi rêya helbestên Hacı Qadir nîqaş bikim, xebata li ser helbesta modern taybetiyên neteweperweriya kurdî û peydabûna wê ku kêma tîn zanîn, zelaltir dike. Wek ku min angaş kir, gelekî beriya çapemeniya çapxaneyî, helbestên Hacı Qadir cara yekem gelê kurd romantize kiriye, diroka kurdan berz kiriye û wateya peyvên wek “milet”, “dewlet” û “weten”ê guherandiye. Lêkolandina helbestên Hacı Qadir derdixe hole ku neteweperweriya kurdî encama jêhaydarbûna hakimiyyeta fikra neteweperweriyê ya li Împeratoriya Osmanî, şerên rizgariyê yê li Balkanan û tirsê neteweperweriya ermen bû.

10 Hassanpour, Amir. (1992). *Nationalism and language in Kurdistan, 1918-1985*. San Francisco: Mellen Research University Press.

Xwendineke Dijmêtinger li ser “Pirça Winda”

FEXRIYA ADSAY

“Elbet ez ê xwe bi awayekî teng di nav girêdana civatekê de (partikularîzm) binax nekim. Lê qet niyeta min tune ye ku ez xwe di rêya gerdûnîtiyê ke xumami, bêşikl û şemal de jî *winda* bikim.”

Aimé Césaire

Kurte

Di pêvajoya mêtinsaziyê de, ligel amûrên şidetê, wêje jî tê de bi zanebûn an bêzanebûn hemû şaxên çandê tîn bikaranîn. Di nav civakeke mêtinkirî de jî asayî ye ku wêje û rexneyek dijîmêtinger zîl bide. Di wêjeya kurdî de çîroka “Pirça Winda” yek ji wan mînakên e ku li dijî rabêja mêtîngê radibe, wê bero-vajî dike. Ev nivîs bi rêya xwendineke dijîmêtinger “Pirça Winda” tehlîl dike û nîqaş dike bê çima ew di nav berxwedana deqî de cih digire.

Peyvên sereke: mêtîngê, dijîmêtingerî, şîdeta epîstemîk, berxwedana deqî, windakirin, xwetî, rastîbîniya fotografîk, rastiya wanekî.